



Zanyariyên giştî ser vaksînlêdana Kovîd-19 bi vaksîneke mRNA (Pfizer/BioNTech, Moderna)

Gelo vaksînlêdan bibandor û ewle ye?

Bikaranîna her vaksînê li Swîsê pêdivî bi destûr heye. Bo vê armancê, divê ew xwedana mercên bilind ên ewlebûn, bibandorbûn û kalîteyê be.

Dezgeha Swîsê bo Berhemên Dermanî, Swissmedic, vaskînên mRNA dijî Kovîd-19 bi başî test û erê kirine. Ew ewle û bibandor in. Çend deh hezar kesan di ceribandinan de vaksîn li xwe dane. Ew bo kesên temenmezî û bi nexweşiyên demdirêj jî ewle û bibandir in.

Ji dema ku wan ew pejirandine, çend milyard mirov bi van vaksînan hatine derzîkirin. Pisporekî hîn jî ser ewlebûn û bibandorbûna vaksînan çavdêriyê dikin. Divê bi zelalî sûdên vaksînê ji metirsiyên wê pirtir bin. Tenê wê demê ye ku ev vaksîn li Swîsê tewsiye dibe.

Li çawan dikarin derziyê li xwe bidim?

Hikûmeta federal stratejiyê derzîlêdanê û tewsiyeyên derzîlêdanê çêkiriye. Ji bo ku hûn bizanibin hûn li ku derê dikarin vaksîn lêden serdana malpera an infoline ya kantona xwe (www.foph-coronavirus.ch/cantons) bikin. Yan jî ji bijîşk, dermansaz yan dermanfiroşê xwe xwe bipirsîn.

Vaksînlêdan ji kê re tê pêşniyar kirin?

Em vaksînlêdana li dijî Covid 19 bi vaksîneke mRNA ji hemî kesên 12 salî û mezintir re pêşniyar dikin.

Ev pêşniyar bi taybetî jî bo mirovên jêrîn e:

- Kesên ku bi taybetî di xetera koronavîrûs de ne (kesên bi nexweşiyek kronîk, mirovên 65 salî û mezintir, û jinên ducan);
- Kesên ku di hawirdora taybet û pîşeyî de bi wan re di têkiliyek nêzîk de ne.
- Em vaksînkirina Kovîd 19 bi vaksîna zarokan ya Pfizer/BioNTech jî bo zarokên 5 heta 11 salî jî pêşniyar dikin (li belavoka "Lêdana vaksîna Kovîd 19 jî bo zarokên 5 heta 11 salî" binêre).

Divê kî derziyê li xwe nedin?

Em li kesên jêrê tewsiye nakin vaksîna mRNA ya Kovîd-19 li xwe bidin:

- Kesên ku alerjiya wan a giran li her cure pêkhateya vaksînan, bi taybet polyethylene glycol (PEG), erê bûye an tromethamine (TRIS) piştrast bûye. Ji kerema xwe jî bo şewirdariyê bi pisporekî alerjiyê re şewir bikin.
- Zarok û nûciwanên jêrî 5 saletiyê. Heya vê gavê, ser derzîlêdana vî emr û temenî agahiyên têr û bes tunene.

Ji kerema xwe bizanin: Gelo taya we zêde ye? Gelo hûn nexweş in û xwe nerihet hîs dikin? Eger wisan bin, wextê derzîlêdana xwe bi paş ve biavêjin. Gelo hûn li benda

encama testa Kovîd-19 ne? Yan gelo hûn li rewşa cudabûnê yan kerentîneyê de ne? Eger wisan in, niha derziyê li xwe nedin. Di zûtirîn wextê de xwe vaksîn bikin.

Eger ez ducan bim an bixwazim ducan bibim, divê çi bikim?

Ma tu plan dikî ku ducan bibî? Eger wisa ye, di zûtirîn dem de vaksînê lêde. Ma tu niha ducanî yî û berî ku tu ducanî bibî vaksînê lê nedaye? Eger wisa ye, em vaksînlêdanê piştî 12 hefteyên ducaniyê pêşniyar dikin (ku tê wateya ji meha sêyemîn a ducaniyê û pê de). Lê, vaksînlêdan di dema ducaniyê de zûtir jî gengaz e.

Eger tu ducan î an plan dikî ku ducan bibî û di derbarê vaksînlêdanê de pirsên te hene, bi pêşkêşvanê lênihêrîna tenduristiya xwe an mamanê xwe re bipeyive.

Vaksînlêdan çawan tê kirin?

Ew dê li fêza milê we derziyê lêdin. Piştî vaksînlêdana yekem, hûn ê 15 deqîqeyan jî bo çavdêriyê li navenda vaksînlêdanê bimînin.

Çend wext carekê pêwîst e derziyê li xwe bidim?

Bi gelemperî du caran derziyê li xwe didin. Hûn dikarin çar hefteyan piştî vaksîna yekem, derziyacaran duyem li xwe bidin. Her du caran derziyê li xwe bidin. Tenê wê demê ye ku hûn dê heya ku mimkin, baş parastî bin.

Eger hûn berê bi awayê erêbûyî tûşî koronavayrusê bûbin, tenê pêwîst e bi vaksîna mRNA carekê derziyê li xwe bidin.

Bo kesên ku pergala wan a ewlebûnê bi taybet zianbar e awarte heye; jî bijîşkê xwe bipirsîn.

Ji bo kesên 16 salî û mezintir, vaksînlêdanê zêde jî 4 mehan piştî temamkirina vaksînlêdana bingehtê pêşniyarkirin. (li belavokê binêrin «*Vaksîna xurtkirinê bi vaksînê mRNA*»).

Vaksînlêdan çawan min diparêze?

Bedena xwe parastina dijî Kovîd-19 çêdike.

Ev piştî derzîlêdana cara duyem heya hefteyekî yan du hefteyan dikişîne. Rîska tûşbûna we bi Kovîd-19-ya giran pir kêmtir dibe. Lê, piştî vaksînlêdanê hûn pir baş jî tûşbûna giran têne parastin. Metirsiya tûşbûna Kovîd-19 gelekî kêmtir dibe. Li gor zanebûna niha, vaksîna mRNA dijî cureyên vayrusên berê yê naskirî jî diparêze.

Girîng e em vêya bizanin: Tiştêkî bi navê parastina temam tune. Hin kes renga bi Kovîd-19 bikevin. Lê, bi lêdana derziyê, şansê wan gelek e ku bi giranî nexweş nekevin.



Ji ber vê yekê, heke nîşanên we yê Kovîd-19 hene tavilê test bidin.

Hûn dikarin zanyariyên berfireh ser çawan bandordanîna vaksînê li vê malperê bibînin www.foph-coronavirus.ch/mrna

Vaksîn dê heya kingê min biparêze?

Vaksînên mRNA gelekî baş hemberî nexweşiya giran a kovîd-19 ya digel razandina li nexweşxaneyê parastinê dike. Lê, wê bo kesên 65 salî = jortir nîşan daye ev parastina vaksînê dikare di dirêjîya demê de kêmtir bibe. Bo van kesan, em lêdana vaksîna xurtkirinê destpêka 4 mehan piştî vaksîna dawîn tewsiye dikin. Hîn jî ne zelal e gelo parastina bi lêdana derziyê hemberî nexweşiyên giran ên kesên jêrî 65 salî û cureyên nû yê vîrusê kêmtir dibe yan na. Ji aliyê din ve, parastina hemberî nexweşiya negiran û hemberî veguheztina vîrusê bo hemû kesan û di dirêjîya demê de kêmtir dibe. Ev dikare angorî cureyê vîrusê zûtir yan hêdîtir rûbide. Loma, em vaksîna xurtkirinê bo hemû jesên ji 16 heya 64 salî jî tewsiye dikin.

Gelo dibe ji ber vaksînê bi Kovîd-19 bikevim?

Na. Hûn dê ji ber vaksînê bi Kovîd-19 nekevin.

Di vaksînê de koronavîrus tuneye.

Eger ez berê bi koronavîrusê ketibim, gelo divê derziyê li xwe bidim?

Eger hûn berê tûşî koronavîrusê bûne, xwe vaksînkirin fikereke gelekî baş jî ye. Piştî tûşbûnê, hûn bi gelemperî ji bo demekê jî tûşbûna dubare tene parastin. Heya kengî, nayê zanîn. Ji ber vê yekê em vaksînlêdanê pêşniyar dikin da ku hûn çêtir û ji bo demekê dirêjtir werin parastin. Ji çar hefteyan piştî erêbûna tûşbûna koronavîrusê, gelek caran dozê bo ewlebûna bingehîn têr dike. Cara duyem a derzîlêdanê dikare neyê kirin.

Gelo tu dûhatên wê hene?

Bo kesên jêr 30 salî, werimînên wisan bi caran piştî vaksîna bi derziya Modernayê hatin dîtin. Loma, vaksîna bi derziya Pfizer/BioNTech bi tercîhî bo kesên jêr 30 salî tewsiye dibe. Bo her du vaksînan, sûda vaksîna Kovîd-19 ji her metirsiya ihtimalî, hetanî li kesên ciwantir de, jî pirtir e.

Lê, werimîna masûleyên dil yan kîsikê dora dil di tûşbûna koronavîrusê de jî piştî derzîlêdanê pirtir e.

Ji bilî vêya, bo bandora gurr a kêlekê heya niha tu tiştê neasayî tunebûne. Mirov dikare li bendê be di nava çend mehan de piştî derzîlêdanê dûhat hebin. Pispor ji nêzîk ve ser nîşaneyên ihtimalî çavdêriyê dikin.

Dûhatên ihtimalî çi ne?

- Dewsa derziyê ser milê we sor dibe, diêşe yan diwerime.
- Headache
- Zêde westîbûn
- Masûlke û êşa kirrkirrok

- Nîşaneyên giştî wekî sarbûn, hîs hebûna tayê yan hebûna taya sivik

Piştî lêdana derziyê ev dûhat bi gelemperî rûdidin. Ew nîşan didin ku beden dijî nexweşiyê parastinê çêdike. Loma, ew di formeke nerm de, nîşaneyên baş jî ne.

Eger bertekeke alerjîk hebe, wek mînak zêde xwêdan, sorbûn, xurîn yan kêmbûna nefesê hema piştî lêdana derziyê rûdidin. Nîşaneyên tîpîk ên myokardiyal êşa sîngê, bêhnçikîn û dilpêtin in. Eger ev nîşane di we de hebin, demildest bi bijîşkê xwe re pêwendiyê çêbikin.

Dûhat heya kingê dikişînin?

Dûhat bi gelemperî piştî çend rojan temam dibin. Gelo piştî hefteyekê hîn jî dûhatên we hene? Gelo ew xirabtir dibin? Yan gelo hûn negîran in?

Ege wisan bin, bi bijîşkê xwe yan pisporê muqatebûna tenduristiyê re biaxivin.

Min derzî li xwe daye. Gelo ez dikarim kesên din bi koronavîrusê bixim?

Piştî vaksînlêdana temam, ihtîmala ku hûn ê tûşî koronavîrûs bibin gelekî kêmtir dibe, û her weha xetera veguheztinê jî kêmtir dibe. Lê, vaksîn 100% parastinê nake û di dirêjîya demê de jî parastin kêmtir dibe. Bandora parastinê û leza kêmbûna wê dikare angorî cureyê vîrusê guherbar be.

Ji kerema xwe bizanin: Şopandina rêzikên paqijî û reftarê û mercên lêdana devpêçê li her dera pêwîst bidomînin.

Kî diravê lêdana vaksînê dide?

Vaksînlêdan bo we belaş e. Şirketa tenduristiyê beşek ji diravê vaksînê dide. Hikûmeta federal û kanton bermaya diravê din didin.

Gelo lêdana vaksînê bi dilxwazî ye?

Erê. Lêdana vaksînê li Swîsê bi dilxwazî ye.

Li ku dikarim zanyariyên pirtir peyda bikim?

Hûn dikarin bo zanyariyên pirtir ser vaksînlêdana Kovîd-19 serdana malpera BAG bikin:

www.foph-coronavirus.ch/vaccination

Yan ji bijîşkê xwe bipirsin.

Yan ji dermanfiroşiya xwe.

